

10 xal: Bi vî awayî em Ewrûpayê civakî dikin

DIE LINKE.

Hilbijêra ezîz, hilbijêrê ezîz,

26ê Gulanê Parlamenê Ewrûpî ya nû tê hilbijartin. Ka li Ewrûpayê wê rewş ber bi ku ve biçê, bi awayekî diyarker girêdayî wê yekê ye ka wê DIE LINKE (PARTIYA ÇEP) çiqasî xurt bibe. Girêdayî dengê tu bidî ye! DIE LINKE doza edaleta civakî û aştîyê dike. Heta niha wisa bûye ku Yekîtiya Ewrûpayê, bêhtir xwe li gorî şirketan eyar kiriye. Şirket ji xwe re li welatan digerin ku li wan bac herî kêmtir e, mûçe û meaş jî herî kêmtir in. Em dixwazin vê pêşbirka ber bi jêr ve bi dawî bikin!

Em dixwazin ku mirov li her devera Ewrûpayê bi karê xwe, karibin xweş û baş bijn. Feqîrî dûrî wan be, her wiha dema kal û pîr jî bin. Em dixwazin ku mirovên ciwan ji bo siberoya xwe netirsîn û endîşeyan nekin. Em dixwazin avhewayê ji rewşa xirab xilas bikin: Em enerjîya paqij û çûnûhatina li rayagiştî vekirî ya bajêr a belaş li seranserê Ewrûpayê teşwîq dikin. Ewrûpaya me ya siberoyê wiha xuya dike, ewrûpayeke ji bo mirovan.

Ji bo vê jî gelek tişt divê baştir bibin: DIE LINKE ji bo wê yekê têdikoşe ku her kes pareke adilane li jiyana civakî zêde bike – her wiha şirketên mezin û mirovên ecêb zengîn jî divê pareke adil bidin. Em ê wan deverên ku baca wan kêmtir e, nehêlin. Planên DIE LINKE hene ji bo wê yeke ka çawa xizmeta baş a tenduristiyê û xaniyê ji her kesî tê kirîna wê bide ji bo her kesê li Ewrûpa asayî bibin. Em li şûna çekdarîbûnê û gurçûpêçkirina eskerî, perwerdeyê teşwîq dikin. Em şerê sedemên penaberiya dikin, ne yê mirovan.

Şirket bi hêza xwe nûneriya berjewendiyên xwe dikin di nava Yekîtiya Ewrûpayê de: Bi hezaran lobîker hene li Brukselê ku zextê li parlamenê dikin. DIE LINKE bi xwe, lobî ye ji mirovan. Ji bo her yekê û her yekî ji me ku tevî me ji bo Ewrûpayeke civakî, adil û ji bo siberoyeke çêtir têdikoşe. Ka bike ku em bi hev re tiştêkî biguherînin. Em doza dengê te dikin ku tu dengê xwe bidî DIE LINKE.

Sînorê mûçeyê herî kêmtir zêde bikin

Sînorê mûçeyê herî kêmtir divê li tevahiya welatên Yekîtiya Ewrûpayê (YE) zêde bibe. Em dixwazin wan mûçeyan ku mirovan xizan dihêlin, qedexe bikin. Ya ku em li Elmanyayê dixwazin ev e: Ti destheq nabe ku saeta wê di bin 12 euroyan de be. Divê li YEyê ew qaîde bê bicihkirin ku heman destheq jî bo heman karî bê dayîn. Şirketên ku îhaleyên dewletê, sazîyên gelemperiyê bigirin, divê sînorê mûçeyê herî kêmtir li cem wan hebe û mûçeyan li gorî peymanê kar a giştî bidin. Ya ku DIE LINKE dixwaze ev e: sendîkayên xurt, kedkarên xurt, mûçeyên baş, bêhtir dem ji bo jiyane. Ji bo her kesî.

Firotna sîlehan rawestînin

YE plan dike ku bêhtir pereyan ji bo çekdarîbûnê û bigurçûpêçbûna eskerî xerc bike û hindiktir pereyan ji bo teşwîqkirina li şert û mercên jiyane yên baş bide. Em dibêjin, Na! Bigurçûpêçkirina eskerî û bi ser de artêşeke Ewrûpî, aştîyê çênakin. DIE LINKE dixwaze çek û sîlehan kêmtir bike, û ew doza siyaseteke derve ya aştîyane dike. YE ji mezintirîn îxracêrên sîlehan e li dinyayê. Ev sîleh şeran gurr dikin û dibin sedema penaberbûna mirovan. Em dixwazin firotina sîlehan qedexe bikin û şerê sedemên penaberbûna mirovan bikin.

Şirket ji ji kîsê xwe wê bidin

Dewlemendî û zengîniya li Ewrûpayê ecêb zêde dibe. Di heman demê de xizanî jî zêde dibe. Şirket salane karên bi milyaran euroyî dikin, lê pirr kêmtir bacê didin. Em dixwazin li temamê Ewrûpayê sînorekî ji baca herî kêmtir re deynin ji bo şirketan, û maldarî û mildariyê li her devera Ewrûpayê. Em ê wan deverên ku bac li wan kêmtir e, tine bikin. Em dixwazin cezayên vedizîna bacê ji bo banke û şirketan zêde bikin. Em ji şirketên dijîtal ên mîna Google û Amazonê re dibêjin, destê xwe biavêjin kîsê xwe!

Çêkirina xaniyên ji her kesî tê kiriya wan bidin

Kirê li gelek bajarên Ewropayê bi ecêban zêde dibin. Xaniyên ku ji her kesî bê kiriya wan bidin, kêma in. DIE LINKE dixwaze awakirina xaniyên giştî (ên şaredarî û dewletê), civakî û li xêra cemawerê teşwîq bike. Hemû welatên li YEyê divê bi qasî ku lazim in, xaniyên ji mirovan tê kiriya wan bidin, amade bikin. Em dixwazin sistemeke sekinandina zêdebûna kirêyan a karîger hebe: Herçî şirketên milk û xaniyan ên mîna Vonovia û Deutsche Wohnen in, em dixwazin wan bikin milkê cemaweriyê.

Teşwîqkirina enerjîya paqij

Hîna ji nivê şevê re 5 deqîqe mane. Em dikarin avhewayê ji felaketê xilas bikin. Heger niha em li seranserê Ewropayê qaîdeyan deynin ji bo enerjîya paqij, em dikarin vê bikin. Em dixwazin santralên elektrîkê yê qirêj ên bi komirê dişuxulin, tavlî betal bikin – herî dereng 2030î hemû wê êdî ji tora enerjîyê derketibin. Herçî santralên atomê û fracking (bi şikandina lat û zinarên bin erdê derxistina gaza xwezayî) e, em wan red dikin. DIE LINKE dixwaze çûnûhatina cemawerî li bajêr a belaş teşwîq bike. Em ê rêyên hesinî yê li Ewropayê berfirehtir bikin: baş û bi buhayekî ji her kesî tê ku bide. Em dixwazin çandîya ji hawîrdorê re dost, teşwîq bikin: herêmî, û bi rê û mesafeyên kurt ên veguheztinê.

Adil dabeşkirina zengîniyê

Sihet û xaniyê mirov tê de biminin, cihê wan ne borsa ye! DIE LINKE dixwaze pereyan ji bazarên finansê vekişîne û ji bo xizmetên cemaweriyê yê baş xerc bike. Em aboriya herêmî û hilberîner teşwîq dikin – bi karê baş û ne neyarê hawîrdorê. Em ê lîsansa wan bankeyan ji wan bistînin ku alîkariyê didin şirketan ku bacê vedizin û nedin. Em ê kar û bazarên spekulasyonê yê bi rîzîko qedexe bikin. Bi baceke li ser bazarên bi lez tîn kirin ên finansê, em ê pêşiyê li spekulasyonan bigirin.

Li şûna fesadiya êrişkar, piştgirî

Em li dijî fesadiya êrişkar a rastgir û nijadperestiyê ne, û em piştgirên mafên mirovan in. Rastgir ji xwe re li wan kesên digerin ku karibin gunehbar bikin, lê ti pirsgirêkê çareser nakin. DIE LINKE çareseriyên pêşniyaz dike ku ji bo hemû mirovan bi kêr tînin. Komunên ku bêhtir mirovan dihewînin, li gorî plana me divê bêhtir pereyan wergirin ji YEyê. Ji bo bêhtir xaniyên ku ji her kesî tê kiriya wan bide û ji bo karê adil ji bo her kesî. Ji bo kêmtir newekhevî û bêhtir hevgirtinê. Piştgirî ne ya parçekirinê ye.

Mûçeyan zêde bikin, xizaniyê kêma

Hemû dewletên YEyê divê garantî bikin ku mirov bi awayekî ewle ji xizaniyê parastî ne: bi sînorê mûçeyê teqawîtiyê yê herî kêma û bi sînorê herî kêma ê ewlekirina debarê. Sînorê herî kêma ê ewlekirina debarê jî li gorî dahata her welatekî tê diyarkirin. Li Elmanyayê ya em doza wê dikin ev e: 1.050 euro – bêyî jê kêmkirin û qtkirinan. Em karê baş li Ewropa çêdikin û pê re jî bernameyê li dijî bêkariya ciwanan. Ev baştirîn sîgorteya Ewropî ya li dijî bêkariyê ye!

Mirovan rizgar bikin

Em nahêlin ku mirov bixeniqin! Divê hiqûqa deryayê dîsa lê be: rizgarkirina mirovan di rewşa hewarê de li deryayê ferz e. Em dixwazin rêyên xwe xilaskirinê yê ewle hebin. Divê em bikin ku mafê mirovan bîn qebûlkin. Komun û şaredariyên ku penaberan bihewînin, wê bêhtir derfet û pereyan wergirin ji bo perwerde û xaniyên ji her kesî tê kiriya wan bide. Ji bo binesaziya giştî têra xwe pere lazim in. Herçî nijadperestî ye, em li dijî wê ne – li her devera Ewropayê.

Em doza dengê te dikin: roja 26ê Gulana 2019an DIE LINKE hilbijêre

Ji bo demokrasiyê ku tê de divê biryar li ser tişteki bê dayîn: 25.000 lobîker ji bo şirket û zengînan zextê dikin li Parlamena Ewropayê. DIE LINKE nahêle ku tesîrê li wê bikin û wê bikirin. Em doza parlamenê xurt û destûreke bingehîn a hevpar dikin. Tevî bi milyon mirovan em têdikoşin ji bo karê baş, avhewayê baş û Ewropayê ku hêja ye mirov ji bo wê têbikoşe. Bi dengê xwe piştta me bigire.

Piştgiriya DIE LINKE bike.
Bi me re kar bike. Çalak bibe:

www.die-linke.de